



07.01.2021

Agahî ji bo dêûbavan

yên ku zarokên wan li zarokxane an li cihên mêzekirina zarokan tîn mêze kirin

Agahî ji bo ragir, birêveberî û xebatkarên

zarokxane û navendên mêzekirina zarokan

Ji 11.01.2021ê pê ve di zarokxaneyê de mêze kirina zarokan

Bi qerara şansolyê û serokwezîrên eyaletan ya 05.01.2021ê lockdowna federalî (girtibûn) heta 31.01.2021ê ve hate direj kirin.

Gor vê yekê ji bo mêze kirina zarokan li zarokxaneyên Nordrhein-Westfalenê ji 11.01.2021ê pê ve rêzikên jêrin muteberin:

Zarokxaneyan:

- Banga acîl tê domandin ku dêûbav çiqas mimkûn be, ji ber ku xwe ji têkiliyê dûr bixin, ew bixwe ji zarokên xwe re mêze bikin.

- Lêbelê, zarokxaneyan bi gelemperî vekirî dimînin. Dêûbav bixwe berpirsiyar in ku biryar bidin ka pêşniyarê werdigerin an na. Ji bo bikaranîna vê daxwaza sertîfîkayên kardarê wekî şerta pêşîn nayê destûr kirin.
- Divê bi taybetî aliyên berjewendiyên zarok bêne hesabandin, ango bi eslê xwe eger gorî nêrîna wan ya zanayî devjêberdanê mêze kirina zarokê ne mimkûne, divê pêşniyariyên li ser mêze kirina zarokan îndîvîduel jî ji malbatê re hîtap bike û wan vexwîne.
- Zarokan ku ji ber sedemên parastina zarokan tên mêze kirin, û her wiha zarokan ku ji ber rewşên dijwar û taybet tên mêze kirin, divê werin mêze kirin. Divê di wan rewşan de çarçoveya mêze kirinê ji hêla birêveberiya Ofîsa Ciwantî ve an jî ji hêla kesekî ku ji hêla Ofîsa Ciwantî ve hatiye wezîfe kirî ve di nav ahengbûnê de bi birêveberiya zarokxaneyê re were tespît kirin.
- Hûkmên talîmatnameya li ser mêze kirina di dema koronayê de(Coronabetreuungsverordnung) muteber e, yanî divê di navbera kesên gihayî de herî kêr 1,5 metre mesafe hebe. Eger girtina mesafeyî herî kêr ne mimkûn be, divê kesên gihayî bi maskeyek li ser dev û pozên xwe bigrin. Divê tedbîrên guncan ên paqijiyê werin girtin û îmkana şopandinê were bi cih anîn.
- Divê li her derê eyaletê de cûdakirina koman pêk were, yanî odêyên sabît tehsîs kirî, kesên sabît(her tim eynî zarokan) û bi gelemperî xebatkarên sabît. Divê komên cûda bi tu awayî nav xwe tekilîyekî rasterast çênekin. Ev ji bo karûbarên rojanê yê pedagojîk, rewşên bîne-bibe, di demên mêzekirinê yê talî de, ji bo bikaranîna odêyan, di demên raketin û xwarinê de muteber e. Mezinahiya herî zêde ya her komê qasî mezinahiya herî zêde ya komê têkildar ya li gorî pêvekê 33 KiBiz(Qanûna Perwerdehiya Zarokan) e. Divê xwişk û bira bi gelemperî li komekê werin mêze kirin. Konseptên(Qismî) vekirî nikarin werin bi cih anîn.
- Ji bo bi cih anîna cûdakirina koman li her derê eyaletê de çarçoveya mêze kirinê di zarokxaneyan de ji bo her zarok bi heftekî 10 saet ve tê sînor kirin. Heya ku çavkaniyên xebatkarên têkildar vê yekê dihêlin û barlêbûnek zêde ya rewşa giştî li zarokxaneyê nikare were holê, wê demê bilind kirina çarçoveya mêze kirina mimkûn bibe. Zarokxanê an jî ragir li ser vê şeqlê têkildar biryar dide.
- Hûkmên ji standartên li ser xebatkaran ya KiBiz tev bi talîmatnameya xebatkaran muteber e.

Mêzekirina zarokan:

- Banga acîl tê domandin ku dêûbav çiqas mimkûn be, ji ber ku xwe ji têkiliyê dûr bixin, ew bixwe ji zarokên xwe re mêze bikin.
- Hûkmên talîmatnameya li ser mêze kirina di dema koronayê de (Coronabetreuungsverordnung) muteber e, yanî divê di navbera kesên gihayî de herî kêr 1,5 metre mesafe hebe. Eger girtina mesafayê herî kêr ne mimkûn be, divê kesên gihayî bi maskeyek li ser dev û pozên xwe bigre. Divê tedbîrên guncan ên paqijiyê werin girtin û îmkana şopandinê were bi cih anîn.
- Di mêzekirina zarokan de bingehîn zarok li gor peymanê mêzekirinê qasî çarçoveya dema tîr mêze kirin. Di mêzekirina zarokan ya kollektîf de, gorî îmkanan divê ji bo xebatkarên mêzekirinê tev bi zarokan ku ji wan re hatine veqetandin ji bo tevahiya dema mêzekirinê ya rojanê odêyên cûda werin amade kirin.

Vî şeqlî xebata pandemiyê ya sînorkirî dê di destpêkê de ji bo maweya lockdownê heta 31.01.2021ê muteber e.

Alîkarîya îlave ji bo rojên nexweşiyên zarokê:

Ji bo ku qe ne ji hêla aborî ve dêûbavan ji lêbarbûnê zêde werin xilas kirin, bi qanûnê federal were rêz kirin ku di sala 2021an de alîkarîya dewletê ji bo rojên nexweşiyên zarokê bi qasî 10 rojên îlave ji bo her yekî ji dêûbavan (ji bo kesên ku zarokê xwe tenê mezin dikin 20 rojên îlave) werin dayîn. Her weha divê ev maf ji bo rewşên ku mêzekirinê zarok li malê didome û gorî banga hikûmeta eyaletê ji mêzekirina hatiye feraxet kirin jî muteber bibe.

Aîdatê dêûbavan:

Wezîr Dr. Stamp bi Wezîrê Darayî Lienenkämper re li hev kir ku dê aîdatên dêûbavan di Çileyê de li giştîya eyaletê werin rawestandî. Şeqlê danîna tezmînatê / celebê fatureyê dikare ji şaredariyek şaredarî cûda bibe. Pêvajoyên niha têne zelal kirin, lê dibe ku ev demek dirêj bibe.

Testên ji bo xebatkarên zarokxane û kesên mêzekirinê:

Hemû birêvebir, xebatkarên li zarokxane û kesên mêzekirinê dikarin di heyama piştî bêhnvedana Noelê ji 07ê Çileyê 2021an heta 26ê Adarê 2021an heta şeş carî bê sedem û di randevûyek serbest bijartî de dikarin testên xwe bidin çêkirin. Agahiyên bêtir di nameya pêvekirî ya li ser testan de têne dîtin.

**Wezaretê Zarok, Malbat, Penaber û Entegrasyonê ya
Eyaleta Nordrhein-Westfalenê**